



**Axivtina Rêvebirê Giştî yê Instîtuta Ziman û Perwerdeya Kurdî  
Li Danmarkê**

**[Instîtuta Kurdî-dk]**

**ROJAN HAZIM ya li konferansê li jêr:**

**Bo Konferansa Zanistî ya Zimanê Kurdî ya li Hewlêrê  
16-17-18 Kanûna pêşîn [December] 2012, Hewlêr**

**Mamosta, zana û bisporên zimanê Kurdî yên hêja,  
Beşdarên birêz,**

Em gelek spasî Wezaretê Kulturê û Lawan û Akademîya Kurdî dikin ku ev konferanse tertîp kirine û em vexwandine konferansê.

Kom û kombûnên zanistî yên bi vî rengî gelek giring û bihadar in. Ji bo peydakirina rê û metodên çareseriyê yên pirs û pirsgerêkên zimanî ev reng platforme heke baş û layiqî mijarê bêne organîzekirin, berwer dibin û di çarçoveya zanistî da jî encamên pozîtîv didin. Rastîyek dî jî heye û divêt bête zanîn ku di çarçoveya van tarz konferansan da problemên bi detay yên zimanî yên bi giştî gramerî û alfabeyî nayên çareser kirin. Ev reng kombûne dikarin polîtîka û perspektîva zanistî tesbît bikin û plan, proje û nexşeyên rêyê kivş bikin û bidine ber zana û bisporên zimanî û herweha desthilata polîtîk û mekanîzmeyên îdarî ku bêne bi cih înan. Detayên problemên zimanî di kom û komikên tinê ji zana û bisporên zimanî pêkhatî da têne çareser kirin ku ew wekî laboratuwarên zimanî ne. Bo nimûne konferansa par ya li meha Îlonê [19-20-21-22 Îlon 2011] li Hewlêrê çêbûyî hem bi terkîba xwe, hem jî bi naveroka xwe ve di warê çareserîya pirs û pirsgerêkên bi giştî zimanê Kurdî da hesûyeke bi ronahî vekir, polîtîka û perspektîveke zanistî pêşkêş kir ku ev yêke di xalên deklarasyonê da tête dîtin. Yêk ji wan xalan jî salane domandina konferansê bû. Heke ev konferanse

dewama konferansa 2011ê be hingê xuya dibe ku gaveke pêşve hatîye avêtin ku eve herwisa hêvîdarîyê jî xurt dike.

Realîzekirina planan dem digire û eve baş tête zanîn. Di konferansa 2011ê da gelek hedefên giring hatin danan. Encamdana hindêk ji wan demekî dirêj dixwaze û eve prosesek e. Lê hindêk tesbît hene ku divêt di dem da gav bêne avêtin ku bin bigire û pêşbikeve. Yêk ji wan pêkînan Civata Bilind ya Zimanê Kurdî bû ku teşkîlkirina vî organî karekî esasî ye û herwisa jî pêdivî ye. Ev organe da plandarîyê bike û zimanî organîze bike ku hewcehîya zimanî ji bo seranserê Kurdistanê û dîasporayê bide. Eve polîtîkayeke neteweyî ye di warê zimanî da. Lê mixabin ku li ser vê yêkê qet hewildanek nehatîye kirin. Dîsa yêk ji xalên deklarasyona 2011ê amadekirina ferhenga Kurdî -Kurdî ya bi hemû zaravayan û du alfabeyan bû. Heke problemên zimanê Kurdî bêne rêzîkirin nebûna ferhengeke bi vî rengî di serî da ye. Lazim bû ji bo vê jî amadekarîyek hatiba kirin. Yêk ji xalên deklarasyona 2011ê jî amadekirina lewha û plakaten rê û rêbar, dikan û avahîyên fermî û sivîl yên li Kurdistan Federal bû ku bi du alfabeyan paralel bêne nivîsîn. Bo nimûne eve gelek karekî lezîn bû. Ji bo vê jî hewcehî bi biryardarîyê hebû. Wezaretê Kulturê dikarî vê daxwazê yêkser bîne rojeva hukûmetê û bike biryar û di pratîkê da bide kirin. Eve jî xuya ye nehatîye kirin. Axir gava em berê xwe didine midehê salekê, ji nav xalên deklarasyonê tinê yêk xal hate bi cih înan ew jî pêkînan konferansê ya salane ye ku ew jî bi direngî û di çarçoveyê gelek teng da tête kirin. Helbet çapîkirin û belavkirina nivîsên konferansa Îlona 2011ê wekî pirtûkek jî xizmeteke pêdivî bû ku ji alîyê Wezaretê Kulturê û Lawan ve hatîye kirin û eve cihê teqdîrê ye.

Li Kurdistan Federal gelek daxwazên di warê zimanî da bi argumenta "eve polîtîk e" têne red kirin anjî paşdan. Esas ev reftare bi xwe polîtîk e ku rê li ber pêşvebirin û reformên di warê zimanî da digire û gelek negatîv e. Mixabin tiştê ku li Kurdistan Federal da tête dîtin ev e, ku kêmasî ye û hetta em dikarin bêjin ku şaşîya herî mezin e. Li Kurdistan Federal kar û xebatên zimanî di çarçoveya mezin ya Kurdistanê û mezinahîya zimanê Kurdî da nayên dîtin. [Helbet em generalîze nakin û yên ku wisa nahizirin jî hene, lê li vê derê em dixwazin balê bikêşîne ser zihnîyeta hakim ya heyî û fonksiyonel. Heq neheq pratîka îro ya li Kurdistan Federal ji derve wisa tête xwandin, bîr û hizireke bi vî rengî peyda bûye di serê Kurdên parçeyên dî da ku gava em berê xwe didine pratîka li vê derê neheq jî nînin. Ji ber ku parçeyên dî danin alîyekê hêj problemên di navbeyna zaravayên li başûr, soranî, kurmancî, hewramî û kelhorî da jî nehatine çareser kirin, di navbeyna van zaravayan da ahengek nehatîye pêkînan. ]. Hertîşt tête biçûk kirin, lokalîze kirin û teng kirin. Mafê Kurdistan Federal heye ku di warê polîtîk, dîplomafîk, ekonomîk û îdarî da heta dereceyekê "lokal" hereket bike, hindêk hessasîyetên reelpolîtîkê li berçav bigire, lê di warê zimanî da ew mafe nîne. Ji ber ku Kurdî tinê li başûr nayê axivtin!. Li rojhilat, li bakur, li rojava, li dîasporayê jî tête axivtin!. Kurdên li parçeyên dî xwe têkilî îdareya Kurdistan Federal nakin, bo nimûne nabêjin bila ev rêye wisa be, an ev avahîye bi vî rengî be anjî hukûmeta herêmê bila bi filan dewletê ra têkilîyê dane an nedane û gelek tiştên dî yên navçeyî mewzûyî behs nakin. Rast xelet, rêvebirîya Kurdistan Federal li goreyî şertên xwe sîstemek danaye û di rê dibe. Lê pîrsa zimanî ne wisa ye. Ji perwerdeyê heta axivtina rojane komple ziman sîstemekî neteweyî ye û mafê Kurdên li parçeyên dî heye ku bîr û hizira xwe li ser bêjin û hetta bixwazin pişqdar bin û rê û metodên bi hev ra karkirinê pêşniyar bikin. Her biryara li ser hebûna zimanî hemû Kurdan eleqedar dike. Ziman wekî sîstemekî komple hem di warê axivtin, nivîsîn, perwerde, bi kar înan û hem jî wekî aletê nivîsîna zimanî alfabe divêt pêkve bête hizirîn. Her destdanek, an reformeke li ser zimanî ya li başûr bête kirin dê yêkser tesîrê li pêkve zimanê Kurdî bike li seranserê Kurdistanê û dîasporayê. Bi esasî di warê zimanî da, lê herweha heta dereceyekê di perwerdeyê da jî mafê Kurdistan Federal qet nîne ku tinê bo xwe bifikire, bo xwe çêbike. Tiştêkî wisa nîne û nabe. Di reformekirin an pêkînan xebatên zimanî da hemû Kurdên li parçeyên dî û yên dîasporayê mafdar in ku bikevine nav prosesa xebatên zimanî. Ji ber vê yêkê di serî da hûn Kurdên Kurdistan Federal xwe ji vê tengîyê, ji vê lokalîzmê xilas bikin. [Em yên ku wisa nahizirin tenzîh dikin.] Ji organîzebûnê heta rastnivîsîn, alfabe û reformên dî yên li ser zimanî yêkser me hemûyan

girêdide. Qusûrê efû bikin êdî hûn nikarin bi serê xwe hereket bikin û biryarên li ser ziman û alfabayê û hetta karûbarên yêkser bi zimanî ve girêdayî bi serê xwe bidin. Em jî hene û hûn mecbûr in ku hesabê li ser me jî bikin. Di serî da zihniyeta xwe biguhorin. Kurdistan ne tinê ev herême ye û zimanê Kurdî jî ne tinê soranîya Silêmanîyê ye û alfabe jî tinê ne ya aramî-erebî ye. Mesele hinde vekirî û zelal e.

Di pirsê zimanî da, di serî da hûn û helbet em hemû pêkve mecbûr in neteweyî bifikirin û hereket bikin. Guhorîn, nûkirin, reformekirin û gelek karên dî yên li ser zimanî divêt bi hev ra bêne kirin. Êdî bes e û em vê helwesta we ya xwe ferz kirinê rast nabînin û esasen qabilî qebûl jî nîne. Hewlêr be, Amed be, Qamişlo an Mahabad be, mafê çû herêman nîne ku di pirsê zimanî da "herêmî" bifikirin û hereket bikin û herwisa xwe li ser hevdu ferz bikin.

Welatê me hatiye parçe kirin, li goreyî şertên reelpolitîka dinyayê mumkun e ku demekî dirêj parçeyên Kurdistanê di nav sîstemekî federal, otonom anjî statuyeyeke dî da bimînin. Lê çu tixûb li ser zimanî nînin û divêt nebin û esasen eve divêt neyê qebûl kirin jî. Her karekî li ser zimanî bête kirin divêt di çarçoveya Kurdistanê mezin da bête fikirîn û bête kirin. "A"yek, "B"yek jî bête guhorîn divêt bi hev ra bête kirin. Şertên politîk û parçeyî yên îro rê li ber pêkve xebata li ser zimanî nagirin. Îro dinya bi rêya teknolojîyê biçûk bûye û em dikarin hemû kar û xebatên zimanî bi her awayî bi hev ra bikin.

Deklarasyona par ya Îlona 2011ê ya konferansa zimanî ya Hewlêrê zemînekî baş amade kir, hedefên maqûl tesbît kirin. Heke di pirsê zimanî da em hemû neteweyî difikirin, hingê di destê ma da planek, nexşeyekî rêyê heye û em dikarin ji nihe ve dest bi realîzekirina wan hedefên di wê deklarasyonê da hatine behs kirin bikin.

Rêvebirîya Kurdistanê Federal û bi taybetî dem û dezgehên bi zimanî ve girêdayî divêt xwe ji vê fikira ne di cih da anku: "Têkilîya digel Kurdên parçeyên dî xezeba Tirkîye, Iran, Sûrîye û Bexdayê dikêşe, lewma divêt tixûbek hebe" rizgar bikin. Em di warê politîk da hinde nigeranî û endîşeyên Kurdistanê Federal heta dereceyekê têdigihin, dûrî ihtimal nabînin û gelek diqqet jî dikin, lê di roja îro da divêt eve jî hinde neyête mezin kirin ku rê li ber têkilîyên navxweyî bêne birîn anjî sist kirin. Ji xwe baskê zimanî bi timamî derveyî vê argumentê ye û sedan rê û metod hene ku bi hev ra kar bête kirin. Vêca hûn ji kerema xwe ji vê hêceta "dijmin nahêlin" xwe zûtirîn dem dûr bikin û bi taybetî di warê zimanî da ev hêcete ji alîyê me ve ciddî nayê dîtin.

Di encam da: Daxwaza bi giştî ew e ku di warê zimanî da xebateke seranserî ya Kurdistanê bête kirin û Kurdistanê Federal wekî hebûneke dewletî hemû imkanên xwe seferber bike û bide xizmeta vê xebata mezin ya neteweyî. Me got û dubare dikineve; deklarasyona konferansa zimanî ya Îlona 2011ê ya Hewlêrê nexşeyê rêyê kivş kirîye û divêt ji vê rêyê varê nebin û ji bo realîzekirina wan hedefan imkanên nû bêne peyda kirin û heke hewce be biryarên nû jî bêne standin. Divêt bi objektîvî bête dîtin ku deklarasyona par [ya Îlona 2011ê] çarçoveyê Kurdistanê amade kiribû û ji bilî hinde xalên spesîfîk yên bi başûr ve girêdayî, cewherê esasî yê deklarasyonê li ser organîzekirin û hedefên mezin yên ziman û zaravayên Kurdî bû ku divêt li ser xeta deklarasyona Îlona 2011ê kar û barên zimanî bêne domandin û pêşve birin.

Yêk pêşniyareke me ya konkret û lezîn jî ev e: Li teniştê kar û xebatên li ber ronahîya deklarasyona konferansa zimanî ya Îlona 2011ê ya Hewlêrê tene kirin, kanalekî TVyê jî xusûsen bo zimanê Kurdî bête danan û divêt hemû zarava tê da bêne temsîl kirin. Ev kanal divêt di bin îdare û kontrola Civata Bilind ya Zimanê Kurdî da be û bi rênîşanîya bispor û zanayên zimanî weşaneke rêkûpêk ya li ser zimanî bike. Heke vê gavê imkanê danana kanalekî xweser nebe, hingê divêt di kanalekî TVyê yê fermî da programên taybetî yên zimanî bêne amade kirin û weşandin û eve jî di bin îdareya Civata

Bilind ya Zimanê Kurdî da bête kirin. Fînansorîya vê TVyê anjî programên di TVyê da divêt hukûmeta Kurdîstana Federal bike û butçeyê xweser ji bo vê yêkê vebire ku li her derê dinyayê karê ziman û perwerdeyê yêk ji erkên sereke yê dewletê ye û Kurdîstana Federal jî divêt vê mesûlîyetê hilgire ser milên xwe.

Bi van bîr û hiziran ji bo konferansê daxwaza serkevtinê dikim û spas.

### **ROJAN HAZIM**

Rêvebirê Giştî yê Înstîtuta Ziman û Perwerdeya Kurdî Li Danmarkê [Înstîtûta Kurdî-dk]  
16-17-18 Kanûna pêşîn [December], Hewlêr

\*\*



## **Not:**

### **Konferanseke binkevî li Hewlêrê**

Di 16-17-18ê Kanûna Pêşîn da [2012] li Hewlêrê konferanseke zimanê Kurdî hate çêkirin. Amadekarên konferansê di rola sereke da Wezaretê Kulturê û Lawan û Akademîya Kurdî ya Hewlêrê bûn. Lê Wezaretê Perwerdeyê, Wezaretê Xwandina Bilind û Sendîkaya Rojnamevanên Kurdistanê jî piştevan bûn û di komîteya amadekar da cih girtibûn. Mesrefa malî Wezaretê Kulturê û Lawan hilgirtibû ser xwe, rêvebirin û amadekirina programa konferansê jî Akademîya Kurdî li pêş bû, anku însîyatîva konferansê di destê Akademîya Kurdî da bû.

Konferans her di serî da ye bi qusûr bû. Navê konferansê "Konferansa zanistî ya zimanê Kurdî" û slogana wê jî "Ziman nasnameya netewe ye" bû ku ev herdu nave jî yê konferansa zimanî ya par bûn ku li 19-20-21-22ê Îlona 2011ê li Hewlêrê pêkhatibû.

Konferansa par biryar wergirtibû ku ev konferansên zimanî bi hevdu ve girêdayî û salane bêne kirin. Lê ya îsal ji nav û sloganê pê ve çu peywendîya wê bi konferansa par nebû.

Konferans bi timamî gelek lokal û heta hûn bêjin teng hatibû tenzîm kirin. Ji parçeyên Kurdistanê zimanzan û zimannas nehatibûn dawet kirin. Herweha ji dîasporaya Ewropa û welatên dî jî hejmareke têra xwe bisporên zimanî nehatibûn vexwandin. Tinê ji Parîsê Dr. Ibrahim Seydo, ji Danmarkê Rojan Hazim û ji Swêdê jî rojnamevan Siyawiş Guhderz hatibûn dawet kirin. Ji Kurdistanê Federal [Herêma Kurdistanê] jî hejmareke gelek kêmbispor hatibûn vexwandin.

Konferans wekî sê roj hatibû plan kirin, lê di pratîkê da rojek û nîv bû. Nîvroja ewil ji xwe bi merasima vekirinê borî. Roja sêyê jî bi komediya pêşkêşkirina encamnameyê derbaz bû.

Dr. Ibrahim Seydo, Siyawiş Guhderz, Dr. Abdulwehab Mûsa û çendek zimanzanên di pêşkêşiyên di çarçoveya ku bo wan hatibû diyar kirin da kirin. Rêvebirê Instîtuta Ziman û Perwerdeya Kurdî Li Danmarkê Rojan Hazim jî wekî mêhvan axivtinek kir. Konferans ji aliyê pirs û axivtinên li ser gotaran ve gelek ye lawaz bû. Rêvebirina konferansê bi giştî bê serûber bû. Konferans adeta ji bo meşrûkirin û ferzkirina Akademîya Kurdî hatibû organîze kirin. Bo nimûne Prof. Izzedîn M. Resûl li şûna ku li ser zimanê Kurdî du gotinên "zanistî" bike, pesindariyeke sivik û vala ya Akademîya Kurdî kir û tixûbê pesindayîne hind bezand û got ku boçî rêvebirên Akademîyê ji destpêka konferansê were tam kadro li rêzên pêşiyê nerûniştine û [adeta] bejn û bala xwe nîşan nedane!..

Amadekirina encamnameya konferansê jî bi tarzekî antî demokratîk û kirêt hate kirin. Ji xwe pêşkêşkirina encamnameyê bi timamî wekî sehneyeke komediya hate kirin. Komîteya amadekar li pişt maseya li sehneyê rêz bûn û ji Akademîya Kurdî Azad Ehmed bi uslûbekî gelek sivik û kirêt, bi navê komîteyê fermannameya Akademîya Kurdî xwand û got ku heke pirseke beşdarên konferansê hebe dikarin bi e-mailê bo wan binivîsin!.

Ewilcar e ku di konferanseke zimanî da kirêtiyeke hinde mezin tête dîtin û beramberî beşdarên bêdebiyeke hinde bêperwa tête kirin. Hûn dê bêjin beşdarên konferansê bo du biskivîtên şehgirtî hatibûn vexwandin û ewqas!.. Beşdar hatin guhdarî kirin û karê wan xilas bû!.. Firseta gotûbêja li ser encamnameyê nehate dan û Akademîya Kurdî fermannameya xwe xwand û dubare kir ku Akademîya Kurdî yêkem merkeza zimanê Kurdî ye û eve bi qanûnê hatîye kîvş kirin!.. Xuya bû ku konferans ji bo ferzkirina Akademîya Kurdî hatibû çêkirin. Mixabin Wezareta Kulturê û Lawan bi rêdana vê reftara negatîv û antî demokratîk ya Akademîya Kurdî bivir li pêyê xwe jî da û konferansa par adeta da pûç kirin. Ji xwe mexseda Akademîya Kurdî jî ev bû ku encamên konferansa par vala derêxe û rê li ber organîzekirina encamên wê konferansê bibire.

Akademîya Kurdî bi fermannameya vê konferansê xwe biçûktir kir û bi vê reftar û helwesta xwe ya negatîv careke dî nîşan da ku ew temsîla zimanê Kurdî nake. Akademîya Kurdî bi pratîka xwe ya li vê konferansê gelek bi zelalî da xuya kirin ku bawerî bi xwe jî nîne û xwe bi hukmê qanûnê dide ferz kirin. Qanûn hergav nîşana meşrûiyet, huqûqiyet û temsîliyetê nîne. Akademîya Kurdî bi vî halê xwe ve ne meşrû ye, ne huqûqî ye û temsîla zimanê Kurdî, ya zaravayên Kurdî nake. Ev konferanse bû tescîla vê rastîyê.

Akademîya Kurdî bi vê zihniyeta xwe ya lokalîst, bi pratîka memûriyeyî ve merkezeke burokratikî ye, her hind!..

Akademîya Kurdî dixwaze alfabeya aramî-erebî û soranîya Silêmanîyê li ser timamî zimanê Kurdî ferz bike. Lê belê bi vê şovenîzma xwe ya zaravayî û alfabeyî esasen temsîla zaravayê soranî jî nake.

Rêya rast ew e ku deklarasyona konferansa zanistî ya zimanê Kurdî ya par li meha Îlonê li Hewlêrê pêkhatî [19-20-21-22 Îlon 2011-Hewlêr] di pratîkê da bête bi cih înan û konferansên zimanî li ser wê xetê bêne kirin û domandin.

**RH**

**Kanûna Pêşîn 2012, Hewlêr**